



Dîwana Helbestvan û Nivîskara
مجلس الادباء والمنتفعين

VAROJ TÊLO

QMIŞLO BAJARÊ EVÎNÊ

ÇIROK

SIPASÎ

Di destpêkê de ez pêwist di bînim ko ji xwendevanên vê çîrokê re diyar bikim ko ez xwe deyindar dibînim ji hin hevalan re , ewên alîkarbûn bi min re di pêk anîna vî karî de , mîna rehmetî Ferhad Çelebî û Ehmed Hiso û Elî Şemdîn , û yên li ser kempiyoterê tîp bi tîp nivîsandin .. û yên din .

Û vî berhemê xwe yê yekemîn ez diyarî Evîndarêñ bajarê Qamişlo (Bajarê Evînê) , û diyarî Evîndarêñ hemî miletê cîhanê dikim , û lêbûrînê ji hunermendê kurd yê bi nav û deng Se'îd Yûsiv di xwazim ko min navê helbesta wî (Qamişlo Bajarê Evînê) li vê çîrokê kiriye .

Û lêbûrînê ji xwendevanan dixwazim ko hin kemasî hebin , û wê hebin jî , ji ber ko ev gava minî pêşîye di vî warî hêviya min jê ewe ko bibe dilopek tevlî çemê Tor û Edeba kurdî bibe , ko mi xwest di vê çîrokê de roniyê bidim ser têkiliyên di navbera kurd û ermenan de wek du miletêñ bira li ser evîn û heskirinê di gihan hev , ne li ser xwînê ko dijminê wan wilo di xwest ..

Qamişlo : 25.2.2007

Varoj Têlo

Ay .. ! ji xwe re li vê keçika ciwan binerin , Fayo dev ji hevdû mayî gote hevalên xwe . Alan bi nerînek mîna birûskê li wê nerî û berê xwe zêvirand bi aliyê Hejar û Fayo de :

- çîma nayê mala wê li aliyê cada dinê ? Hejar gote wan .
- Tu bi xwedê kî ? , Fayo bi matmayî gote Hejar û çavên herdiwan hîna bi ziq li serê Caklîn bû .
- Alan di nava dilê xwe de di keliya , lê ne wêrîbû hesê xwe bi şanî hevalên xwe bike da ku jêre jêre ne bêjin : te dît bê çawa tu jî wek meyî , kêfa te ji qîzikan re tê ..

çavîn Caklîn li Alan ketin û ew ezet nefsa bi sînyalan li hundirê navê de ket gava dît ku çawa xortek wek vîna bi ziq li wêna ne nerî wek hemû xortên din .

Ew bi van ramanan bi Lena re derbasî Mamîgona Kerem bûn .

Ev Mamîgon piçûk bû , nû vekirî bû , Kerem ew hema li hewşa mala xwe çend kevir û sîlak li erdê kom kiribû , berê jî ewî (Dondirma)difirot .

- Meş lawê Xwedê em li pey wana herin , Fayo ji hevalên xwe daxwaz kir .

- Fermo , Hejar gote Fayo , lê Fayo bi çembilê herdiwan girt , daku ew berya wan derbasî Mamîgonê bibe .

Xortên di Mamîgonê de bi ziq li bedewbûna Caklîn di nerin , Qîzên Mamîgonê jî li Alan di nerîn .

Lê çawa awirêن Alan bê hemdî wî li awirêن çavên Caklîn diket dilê wî bi lez lê dixist .

Ji xeynî gava ku bi fotbolê dilîst tu carî bi vî awayî dilê wî lê nexistiye . kesek ne di karî xwe bi parêze ji tîrêjên yekemîn yêvîndariyê .

Êvarî li malê çiqas Alan xwe qulapt di nav ciyê xwe de , li çep û rast .. xewa wî ne dihat , çavên xwe di girt sûretê wê keçikê di mejiyê wî de mabû , çavên xwe vedikir , sitêrikên ezmanan di beriqandin wek nêrînên çavên Caklîn .

- Xewa min nayê , bi ufînî Caklîn gote Lena tevî ku se'etek derbas bûbû ku ew û lena di nav ciyan de bûn .

- Raze , ji sibhê re tiştek nema . Lena bi giraniya çav li xewî li Caklîn vegerand .

- Lena!

- ha .

- Te xortek dît li Mamîgona Kerem ?.

- Li wira tije .. ti .. je .. xo .. rt .. bûn , Lena bersiv da û baweskandin ji wê qut ne dibûn .

- Rabe , xewa min nayê .

- Lê xewa min t.. ê ..

Lena bi zor bersiva xew da û çend deqe di wê navê re derbas nebûn heta bû pixe pixa wê .

Caklîn çiqas sitêrik hejmartin û ne hejmartin xewa wê qet ne hat .

Tîrêjên rokê xwe belav kirin li ezmana , rojê ruyê xwe yê ciwan derxist û sitêrikan xwe ji fedîbûna veşartin li ber xweşikbûna tîrêjên rojê yên ku her deqe zêdetir di bûn li ser vî bajarî û ..

Gava Alan ji dewama xwe dereng dima ewî xwe di ser dîwarê (URÛBA) re diqevast , ji ber ku heta bigihişa dergehê wextek dirêj dibir .

Bi lez kete wengeha xwe û çû li teniştä Fayo rûnişt .

- Siba we bi xêr , Alan gote Fayo û Hejar yê ku li pişt wana rûniştî bû .

- Ev çawa çavê te wilo sor bûne û dengê te wilo ziwa bûye ? Fayo ji Alan pirsî .

Alan li Fayo nerî û xwest bêje wî bê çîma ewî nikarîbû rakeve , lê ew tirsiya ku Fayo û Hejar qerfê xwe bi wî bikin .

- Ez .. ez .. min xew ne .. devê Alan tev li hev bû .

- xuyaye tu pir bi şev dixwîne , Hejar gote hevalê xwe.

Lêvên Alan ji hevdû vebûn û bû gernijînek , bersiva Hejar hate wek alîkariyekê .

- Belê .. ezbenî .. min dixwend . Alan bi zor peyivî .

Ewî serê xwe hejand û gote wan : Tu di pişt mere dixwîne , Fayo bi xeyd gote wî : new elê ye .

- Win dizanin ku ev heftiya dawiye êdî utla xwendinê dest pê dike .

Alan serê xwe hejand û di xwest sipasiya Hejar bike ku wî bi vê bersivê ew xilaskir ji pit-pita Fayo .

Tara (MIWEZEFÎN) XWEŞ tare ye , hejmara xelkê wê bêtir Fileh bûn , tenê mala Hejar û du malên dinê kurd bûn .

Di navbera mala Hejar û mla Caklîn de erdek fireh hebû , hinek şînkayî lê hatibû çandin . Di heftiyê de pirtir ji sê caran ITFAY'Î dihat ew avdida .

Rojê hin bi hin xwe diveşart û ezman bi alî sorbûnê ve di çû . pîrekên vê tarê , çîzên wê jî di vê demê de derdiketin ber deriyên xwe dirûniştin , dendik û çaya xwe jî bi xwe re der di xistin , wisa jî rûniştina xwe berdewam dikirin heta ku dunya tarî di bû êdî nema qedeh û dendikên xwe di dîtin , wê çaxê her kes derbasî mala xwe dibûn . çend amûdên elektirîkê hebûn lê bi zor şewqa wan çend mitran dora xwe ronî dikirin .

- Êvara we bi xêr !.

- Êvar bi xêr , diya Hejar û Xaltîka wî lê vegerandin û bi nerînek ne nas lê nerîn .

- Xaltîkê , hejar li male ? .

- Belê , diya Hejar li wî vegerand .

- Ez dikarim wî bi bînim ?.

- Hejar ..Hejar !! .

Gava deng ne çû Hejar , diya wî bi giranbûna laşê û xîz-xîza sînga xwe çû kete hundur û tev lawê xwe derkete ber deriyê hewşê .

Çawa çavê Hejar li Alan ket dawa derbasbûna hundur lê kir , lê Alan bi (NA) serê xwe hejand .

- Ka em hinekî ji xwe re bi meşin , û li ser xwendinê bi peyivin , Alan daxwaz kir ji Hejar .

Hejar li diya xwe nerî , da ku destûra wî bide , diya wî her tim ji wî re di got da ku bixwîne .

- Başe , here kurê min , lê dereng ne mîne , dayikê hêvî jê kir .

Herdû heval bi dengekî nîv bilind li ser progirama xwendinê peyivîn , û çawa dim eh û nîvekê de ewên haziriya xwe bikin ji imtîhana (BEKELORIYA) re .

- Emê li ku bixwînin? Alan ji Hejar pirsî .

- Emê rojekê li cem te , û rojekê li cem Fayo , û rojekê li cem min bixwînin .

- Pir başe , lê ..

- Lê çi ?.

Alan dîse nabûna xwe li ser vê pêşniyarê diyarî kir : mala Fayo tenge , xaniyê wan di avayiyêñ çar qat de ye , jorêñ wan pir tengin .

- Başe , em li cem min bixwînin !!.

Ruyê Alan geş bû û bi rûkenî got : Sipas Hejar , tu her tim qenciyê bi min re dikî .

Piştî ku xatir xwest , ewî berê xwe da alî mala Caklıñ û meşî , ewî nizanîbû bê kîjan mal ya wêye , lê hate bîra gotina Hejar (mala wê li hemberî mala me ye) , ewî çavêñ xwe gerandin , lê bê fayde , dunya tarî bû , tu kes li ber cadê nebû .

Heftiya yekemîn ji utlê derbas bû , Fayo û Alan dihatin mala Hejar di xwendin .

Diya Hejar ne di xwest ku kurê wê bi hevalên xwe re bide û bi stîne , lê gava dît ku lawikê wê bêtir di xwîne gava herdû hevalên wî di hatin cem wî dilê wê geş dibû , ewê xêr hatin bi wan did a , hergav jî şîranî , çayê .. pêşkêşî wan dikir .

- Xwezka diya min jî wisa guhdan bi min û hevalên min bikira , Fayo bi ahînî gote Hejar .

Herdû xortan ji wî fam kirin û nerînê bi dilşewatî li Fayo nerîn , yek rast jî berê gotinê guhertin da ku Fayo acıztır ne be .

Çiroka Fayo dûr û dirêje , û li vir cihê wê tune ye , lê tenê ev herdû heval di zanî bûn ku bavê Fayo diya Fayo revandi bû , ji ber ku bav misilman bû , dê jî cihû bû .

Piştî ku Fayo û xwişka wî çê bûn dayika wan hîna ciwan çû ser dilovaniya xwedê .

Jinbava wan pir te'ide li wan di kir , tevî ku ew jinbav musilman bû .

Gava Hejar hêşirêñ Fayo dîtin , ewî berê gotinê da bi aliyekî din ve :

- Fayo , tu dizane ku xaço hevalê min gote min ku çend pirsêñ nû hene sedî sed wê di imtîhanê de werin ! .

- Ji kîjan made ne ? Alan pirsî .

- Ji matmatîkê , Hejar bi dengekî bilind got .

Hişê Fayo bê hemdî çû ser vê axaftinê û diya xwe di vê deqê de di vê malê de ji bîr kir .

Çiqas diya Hejar ji wan di xwest ku ew firavînê û taştê bixwin lê ewan ne dixwarin . Hejar bi wan re derdiket heta dikana apê Ferho , ya ku ji dondirma , gazûz , boncûs û çıxaran pêve tiştek lê ne bû . ew bûbû ji wan re adet ku her roj nîvro û êvarê herin vê dikanê tiştekî bikirin .

Heftiya yekem û diwem ji utlê derbas bûn bê ku çavê Alan li keçika ciwan bi keve , ewî nikarîbû ji Hejar pirsa wê boke , carna Fayo di xwest li ser (cada evîniyê) bi meşe û here malê , lê Alan ji wî dixwest ku ew herdu di nav (muwezefîn)a re herin malê .

Gava istîraha wan bû , hişê Alan kûr û dûr di çû :

- Eee .. tu çû kû? .

- Nîvê hezarekî çende ? Fayo ji Alan pirsî .

- 200 , Alan bersiv da .

Bû tiq tiqa kenê Fayo û Hejar :

- Te çi got ? .

Fayo li Alan nêrî û got :

- Min tiştek ne got .

Dilê Alan lê diket û çavên wî ziq dibûn , di bin berçavka wî ya qalind re :

- Ez çaw ate bibînim ? Tu li kû yî ? Tu çîma diyar nabî ? ..

- Hey .. hey !! Tu kûve çû dîsa ?.

- Hê .. te çi got ? Alan li Hejar vegerand .

- Bi xwedê ez bawerim , Fayo destpêkir û têde çû .. ku zilamê me evîndare!! .

Alan serê xwe danî û li pirtûkan nerî .. :

- Ma çi pêve ye .. ez nizanim ez bêjim wan li ser wê .. na .. na wê Fayo min bihetikîne ..

Alan serê xwe hilgaft û mîranî da xwe û got :

- Ez bi dilim !.

- Ma kî ji me ne bi dile ? Fayo qerf kir .

- Ma insane bê dil dijîn ? Hejar temam kir û herdû kenîyan .

Tevî ku herdiwan ji wî famnekiribûn lê wan qerfê xwe dikirin , Alan jî matmayî ma :

- Ez dizanim ku mirov bê dil nikare bijî , lê mebesta min ewe ku ..

Alan peyivî û hinekî bê deng ma û ji nişkan ve got :

- Ez evîndarim !.

- Na lo , wilo me bêje ! Hejar matmayî lê vegerand .

Dîse pirqîna ken bi herdiwan ket , Alan rahişte pirtûkên xwe û ji mala Hejar derket .

Dunya safî bû , bîna hinek henekan hatibû vê tarê , Fayo jî alîkarî kir bi henekbûna vê tarê .

Ev roja yekşemê bû , Ferho ne ïn û ne şemî , dikana xwe ne digirt , dikana wî dim ala wî de bû , . hema ew her tim li ber deryê dikanê bû .

Hejar û Fayo gihan Alan li cem dikana Ferho , . Fayo bi dilşewatî gote Alan :

- Me henek bi tere dikirin mal neketo .

- Ma çima ez bûm pêkenokê we ? Alan gotina xwe got bê ku li wan binere , şelîmona kazozê xiste devê xwe û mijand .

- (Ahlên û Sahlên) , dengê Hejar kete guhê Alan .

Ew hat ku xwe bizîvirîne lê xwe girt da ku ne nêre , ew bi rastî silava hinekan dike yan ew henekan dike .

- (Ahlên) , bersivek bi dengekî nerim kete guhê wî .

Xwendina te çawa derbas di be ? Hejar ji Caklîn pirsî , devê Fayo ji hev ma û bê deng ma .

- Ne xirabe , Caklîn bi şermî bersiva Hejar da .

- Tu li kûyî , ne xuyaî ?.

Ez li Hesîça me , li cem mala xaltîka xwe di xwînim , qîza xaltîka min jî bekeloriya di xwîne , em bi hev re di xwînin .

Alan hêj li pişt xwe ne dinerî , ji mecbûriyaku şûşa kazozê bide Ferho , çawa çavên wî li Caklîn ket , şûşe ji destê wî ket û hûr-hûrî bû .

- Wax .. ! Ev ewqas dengê te bû û min guhdariya ten e dikir ? .

Alan cam dida hev , ji dest hejandinê qizêzên şûşê dîse ji destê wî ketin .

- Xwe bigre kuro ..

- Çawa tu li vire û min guh neda te ? .. Çawa ne ket bîra min ku kesê sisyan ji van xortan tu bû ?.

Çawa nêrînêwan li hev ketin ew matmayî mam .

Caklîn bi nêrînêwan dizî li Alan di nerî , di nava xwe de di keliya û bi xwe re di peyivî .

Apê Ferho bê dengiya wan şikand gava ku melkes anî û ji wan xwest ku xwe bidin aliyekî .

Rûyê Caklîn sor bû û di xwest ku bikene , lê ewê xwe girt .

- Ci ji te re pêwiste ? .

Caklîn li apê Ferho nerî û got :

- Ka paêtekê ji bavê min re .

- Ez ji wê roja te de raman dikim .. Wax , bê tu çiqas ciwanî !! Hîna Alan di nava xwe de bi xwe re di peyivî .

Ci bi te hat ? ma te qîzik ne dîtine ? Hejar ji Alan pirsî .

- Ev ne qîzike , ev horiye .. ev sitêreke .. ev kulîlkeke ! Alan bi hesretbûn got .

- Bese .. bese .. Fayo gotina wî birî û got .

- Birako , xwiya ye tu bi rastî bi dilî .

Ev gotina Fayo dilê Alan xurt kir û hişt ku ew ramana xwe bêje wan .

- Ez evîndarim !.

- Wax ! Çi zû ? Fayo qerf kir .

- Tu bi rastî di bêje ? Hejar daxuyanî ji Alan kir .

- Blê , ji wê roja Mamîgonê de ..

- Lê tu dizanî .. ew fileye , ermeniye !.

- Çi pêve ye ? Alan got , tu çi di bêjî ? piştî rawestekê pirsî.

Ji xênî Hejar , Fayo û Alan tu kesî din bi evîndariya Alan û Caklîn nizanî bû , tenê Caklîn ji keçikan dizanîbû çawa çerp-çerpa dilê wê ye gava ku Alan dibîne .

Roj dibûn şev û şev dibûn roj , her sibeh û nîvro û êvarî Alan di ber mala Caklin re derbas di bû û di çû mala hevalê xwe (de derkeve , xwe bi şanî min bide ey delala min , ez dinalim .. ez dişewitim gava ez te nabînim !!).

Rojên imtîhanê nêzîk dibûn , xwendevanên bakaloriyê xwe ji wê rojê re amade dikirin .

Her ku Alan û hevalên xwe hevdû didîtin , gotina Alan tenî li ser evîndariya wî bû .

- Kuro lawo , çend roj tenê ji imtîhanê re mane , gereke em haziriya xwe baş bikin . Alan bi ziq li Hejar nerî .

- Eger tu , an win ji gotinê min li ser Caklîn acizin , ez nema têm vêderê .

- Em aciz nabin , lê gereke tu hişê xwe bidî xwendina xwe , Fayo şîreta xwe got bê qerf , ev cara yekem bû ku Fayo bê qerf dipeyivî .

(Wa .. evqas xwendina imtîhanê Fayo guhertiye , û ew bû yê ji min re digot ku evînî xweşe , ji her tiştî xwestire) , Alan xwest bîna bîra Fayo , lê ew ma bêdeng hinekî .

- Başe ! win xwendina xwe bikin , Alan bi acizi gote wan û çixareyek vêxist .

- Heylo ..! Tu ji kengî ve çixarê di kişîne ? Hejar bi matmayî ji hevalê xwe pirsî .

- Ev du heftî hene , Alan gotina xwe bi diwê çixarê re got .

Roja yekem ji imtîhanê Alan çû dibistana (El-Qadisiyê) , li wir imtîhana wî û ya hevalên wî bû .

Çawa ew zîvirî li ser cada Caklîn ku ji wir here dibistanê çavê wî li Caklîn ket , dilê wî bi lez lêxist û kabokên wî lerizîn .

Bi min re ne peyive li vê derê , Caklîn bi hêvîdarî ji Alan xwest .

- Başe , Alan got û di ber re çû , bi dengekî nizim jêre got :

- Ezê li pş te bi meşim , tu jî li pêşîya min bimeşe , kengî em ji tarê dûr ketin ..

- Başe , Caklîn sor bû û di ber xwe de got .

Kesek li ser cada (Qewetlî) tune bûn gava Alan xwe nêzîkî Caklîn kir

:

- Evîna dilê min , jiyana min , min çiqas bêriya te kiribû ! Her ku çûkek dihat min dipirsî : (Te delala ber dilê min ne dît ?) . Caklîn ji fediya sor di bû :

- Ji bo xewdê van gotinan ji min re ne bêje , berê min li ser imtîhanê ye .

- Ez nikarim hesê xwe ji tere ne bêjim , ji roja ku ez û te bi hevdu re çûn cem sikeya tirênenê , ez li hêviya te me , delala min ..

Li vir çend keç û xort di ber wan re derbas bûn , Caklîn gavê xwe bi leztir kirin û Alan jî pêre .

- Şerme tu wisa bi min re dipeyivê , xelk wê çi bêjin ?.

Ew kesên ku di ber wan re derbas bûn û hinekî di veceniqîn dengê Alan digiha wan .

- Xelk ? Ci işê me ji xelkê heye ? (Ya alem ya hooo) !! .

- Bese , ji bo yesûs ! ji box wedê te min hetikand !! .

Ma evîndarî te hetikandiye delala min ? Dîse Alan deng derxist , min bêriya te kiriye , ma te bêriya min ne kiriye ?.

Caklîn bi gavêن hêdî hêdî meşîya , û çavên wê bi hêsisir bûn (Xwezî te zanîba , evîndarê min , bê çiqasî tu di dilê min de şêrînî , her ku min yek li cadê di dît , dema ku min li ser xanî dixwend , min di got erê va delalê min hat) , Caklîn xwest van gotinan bibêje lê tiştek ji hunderê wê ew sekinand , hêsisirê wê hatin xwar :

- Ma .. min çawa bêriya te .. Caklîn bi dengekî nizim gote Alan .

Alan bû bi bask , nema li dora xwe dinêrî , te di got qey di vî bajarî de kes tuneye , tu deng jî nebihîstibû ji xeynî yê Caklîn .

Hevaleka Caklîn pêrgî wê bû , berê wê jî li dibistana wê bû :

- Waw ! Ewqas tu ji imtîhanê ditirse ku wilo hêsisirê te dibarîne ?.

- Erê .. hê .. na .. ne tiştek , devê Caklîn tevlî hev bû û çû derbasî dibistanê bû .

Gum-guma keçikan bû li hewşa (Zekî Ersozî) , her çend keçik xwe dabûn hev û du , pirs ji hev dikirin yan jî li ser xwendina xwe dipeyvîn , tenê Caklîn mabû bi tena xwe , ewê dixwest bi tenê bimîne û ramanêvîn evînê deriyê xwe vekin .

Her roj ji rojêñ imtîhanê gavêن Alan hêdî hêdî li dû gavêن Caklîn bûn , tenê wilo karîbûn hevdu bibînin .

- Wê kengî imtîhan temam bibin da ku ..

- Te çawa nivîsand ? Caklîn pirsî .

- Ez .. ez nizanim .. ne imtîhan , ne xwendin , ne diplom .. ev tev ne dibîra min de ne , min tu qizinc kiriye wekî min dunya qezinc kiriye .

- Na Alan , eger tu ji min hez dike tê ..

Bi hatina Hejar û Fayô bi aliyê wan ve , Cakê gotinêñ xwe qut kir û ji herdiwan re got :

- Ji bo yesûs bila çavê wî li xwendina wî be , û ew bi gavêñ bi lez bi aliyê dibistanê ve çû.

- malneketo , tu dibê qey te qîz ne dîtine , Hejar ji Alan re got .
- Min qîz dîtiye , min evînî dîtiye , Alan bersiva xwe da û her sê derbasbûn dibistanê .

Çawa examînê bakaloriyayê bi dawî hatin , piştî wê bi heftîkê Alan û Caklîn çûn ciyê xwe yê berê , çawa herdû evîndar .

- Delala min , mala xwedê ava ku imtîhan temam bûn .

Caklîn keniya û dawiyê xwe girt û rengê rûyê wê hate guhertin :

- Alan !.

- Alan serê xwe danîbû ser milê Caklîn di wê çiqîna germa temûzê de di bin boriya karêzê ya ku demirê tirênen di ser re diçe rûniştî bûn .

- Çiye ?.

Bi vê weşayê Alan serê xwe hilgaft û gernijî , berçavkên xwe rakirin , dest bi ramûsandina Caklîn kir , lêvên wê ji bê ramyarî ketin ser lêvên Alan .. lê ji nişka ve ewê destê xwe danî ser sînga wî û ew dûrî xwe kir :

- Wê pêwendîya me çawa be dawiyê ?.

- Pêwendîya me .. ez evîndarê te me û ez .. Alan bi germî got , lê Caklîn gotina wî birî :

- Ez dizanim , lê ..

- Lê çi ? Alan peyivî û devê wî ji hev mabû .

- Lê te ji bîr kiriye ku ez fileme û tu jî musilmanî .

- Yanî çi ?.

- Yanî di baweriya min de em ji îro pêve nema hev bibînin .

- Tu dizanî bê tu çi dibêje ? Alan bi acizî lê vegerand û got :

- Kesekî din di dilê te de heye? Ewî pirsî .

Caklîn bi ziq li wî nerî û rabû , hêşirên wê barîn .

Gava Alan xwest di riya wê de bisekine , Caklîn ew dehifand ûgavêñ xwe bi lez kir .

- Wey ..! ez çi ehmeqim ..!!.

Alan xwe gihad wê û xwest wê bi dest xwe bigire , lê ji ber ku Caklîn gihabû cada (Kornîş) Alan bê çar mabû .

- Em kengî hev bibînin ?.

- Em nema hev dibînin !.

- Caklîn ..

Çend heftî derbas bûn , di vê demê de Alan sibehê û piştî nîvro di çû cem Hejar , carnan ew herdû bi tenê bûn , carnan jî Fayo li gel wan bû .

Ewan di çûn dikana Ferho , kazozên xwe vedixwarin û li wir radiwestiyan , lê bê ku delala wî derkeve , û eger ew li derive rûniştbane , çawa çavê wê li Alan diket ew derbas dibû mala xwe .

Dibû tep-tepa dilê Alan û qirka wî ziwa dibû , nigê wî di lerizîn .. (min bêriya te kiriye , bêriya çavêن te .. pora te .. min bêriya lêvên te kiriye .. guhêن min giran bûne ji roja ku dengê te jê qut bûye , ez dinalim , ez dişewitim ..).

- Wella birako xwiyaye ku ew heta roja qiyametê wê bi tere ne peyive ! Hejar bi dil şewat got û li Fayo nerî , li Alan nerî , yê ku hişê wî qet nemabû li ser herdû hevalên wî , ewî bi ziq li deriyê mala delala xwe di nerî .

- Ez bawerim eyna di roja qiyametê de her roja munasibe , Hejar di qehra xwe de destpêkir û bi nalî bûn pêde çû :

- Di vê rojê de tenê evîndarêن ku nikarîbûn bi gihêne hev li ser vê erdê , û yên ku ji diyanevê dinê wê karibin bi serbestî bi hedu re razin û bigihêن hev .. tenê di vê rojê de .

Ewî ev gotinêن dawî bi dengekî nizim got , te digot qey ji xwe re di bêje .

- Wa hat ! Alan bankir . herdû hevalan li pişt xwe nerîn û dîtin ku Caklîn û Lena bi hevre tên dikana Ferho .

Lena bi meselê dizane û ew jî di wê baweriyê de bû ku em filene û ew musilman ji hev re nabin .

Caklîn di xwest ji Lena re bêje da ku ew vejerin malê lê Lena bê deng mabû .

- Ez dixwazim te bi bînim , Alan ji wê xwest .

Caklîn bê deng dima.

- Min bêriya te kiriye , ez evîndarê te me , lê Caklîn zer bû û ditirsiya ku Alan tiştekî ehmeqî bike , ji ber vê yekê ew bi lez vejeriya malê .

Lena ma tenê li cem dikana Ferho û Alan ji wê xwest ku ji Caklîn re bi bêje ew di xwaze wê bibîne li eynî cîh di roja pêncsembê de .

* * *

Ciqîna germê bû , duniya bê deng bû di wextê nîvro de , bêtira xelkê razayî bûn .. piştî xwarina giran .

Caklîn çû li pêşıya wî , Alan bi dû de meşîya . Çawa rûnişt Alan ew zîvirand bi aliyê xwe ve û lêvên xwe xistin ser lêvên wê .

- Ez .. ez .. Alan bi bîn çekandî gote wê .

- Hiş ..

- Ez hazirim ku ez bêm te bixwazim , hazirim te birevînim !!.

- Hiş .. birevîne?! Caklîn matmayî ma .

- Belê , eger dê û bavê te te nedîn min ezê te birevînim .

- Tu di zanî tu çi di bêje ?.

Alan serê xwe hejand û dîse lêvên xwe gihadin ruyê wê , herdû destê wan di destê hev de dimeşîyan .

Ji nişkan ve gava çavê Caklîn li pîrekek ereb ket ewê destê xwe ji destê Alan kişand , Alan şiyar bû ji dilovaniya xwe û tê gihişt ku gerek dûrî wê here .

Bîdros û hevalekî xwe pîkapek dajotin li ser cada Kornîş .

- Malneketo , ka hema ez carekî bajom , Xaço ji Bîdros xwest .

- Ezê bi dm te , lê gerek tu hêdî hêdî bajo . Bîdros bi hêvî ji Xaço daxwaz kir .

- Başe .

Xaço daket û zivirî li dora pîkapê , û vege riya siwar bû , çawa siwar bû ewî dît ku xuîşka wî û xor tek nêzîkî wê dimeşe , xwêdanekê ew girt , ewî xwest here jê bipirse da bizane ew xort kîye , lê ji nişka ve hate bîra wî ku Bîdros pêre ye û ne xwest ew bi zane ku ev keçika bi vî xortî re xwîşka wiye , ewî serê xwe tewand da ku bi de xuyakirin ku ew li hinek kassêt dig ere .

Çawa Caklîn û Alan cade kornîş qut kirin Xaço pê li banzînê kir û xurt bi aliyê malê ve ajot .

- Ew kî bû , ew xortê bi tere ? Xaço ji Caklîn pirsî gava ew ket hewşê û bi gavên bi lez ber bi Caklîn ve çû .

Devê Caklîn ji hev ma , heme çawa ew peyivî Xaço şerpînek ji wê anî , xwînek sorî vekirî hêdî hêdî jip ozê wê hat , xwîn hat ser lêvên wê , kete nav diranê wê û di bin lêva wê ya jêr de sekinî .

Caklîn matmayî li birê xwe nerî . Xaço porê wê kişand û serê wê li dîwar xist :

- Ez ji te re di bêjim ew kî bû ?

Caklîn dest bi girî kir , ew hinekî gêj bû , destê xwe da dîwar da ku xwe bigre û nekeve , gava ku wê li xwar nerî dît ku nuqtên xwînê zêde tir dibin , ew xwîn nema xweşik dihat xwiyakirin ji ber hêşirên wê :

- Çima wilo ey xwedan ? Caklîn di nava dilê xwe de peyivî , îroe v roja min ya xweş wilo bibe , raste tu birayê minî lê ..

- Bes !.

Dengê diya wê kete guhê wê , bi dengê diya xwe re ew bi ceger tir bû :

- Ma işê te çi pê ketiye ? .

Hîna Caklîn gotina xwe temam ne kiribû , Xaço pehînek li zikê wê xist . Caklîn ket erdê û ji hiş çû !

- Caklîn !! .. dayika wê kir hawar !! .

Bavê wan daket û çû şeqamek li Xaço xist .

- Ji dêvla ku tu sipasiya min bikî p tu şeqamê li min dixîne ! Xaço bi xeyd ji bavê xwe re got .

- Ser çi sipasiya te bikim ?.

- Min îro qîz ate bi xordekî re dît ! .

- Bi xordekî re ?!.

- Belê .

- Bese gotinê we , werin rahêjin keçikê . Dayikê bi dengê lerizî ferman da herdiwan .

Bav rahişte qîza xwe , Xaço çû metbexê û gelek araq bê av û bê bûz vexwar .

- Qîza min !.

Dayikê bi girî banker keça xwe û hinek av li ruyê wê kir , gava dît ku bi avê şiyar ne bû çû koloniya mîrê xwe anî û ber pozê keça xwe :

- A .. Ala.. Alan ..

- Ev Alan kkiye ? bav matmayî pirs kir .

- Ma niha dema vê pirsê ye ? Dayikê li bav vegerand .

Roja din nîvro bi zor Caklîn rabû ser piyan sekinî , dîwar û dîwar xwe gilande qedemgihê , verişiya û zû zû mîza wê dihat .

Hinek av li serê xwe kir lê mixabin ji gerim bûna havînê û ji ber pihîna Xaço ew dîse ket .

Li gurmîna ketina wê diya wê rabû çû oda wê dît ku Caklîn ne li wi re , bi lez çû qedemgihê :

- Qîza min , çi bi te hatiye ? wey xwezî bozingek mezin lit e bixîne
Xaço !!.

- Ay .. dayê , Alê ..
- oy .. dayê bi qurban ..
- Ay .. dayê !.

* * *

Çend roj derbasbûn , Alan diçû û dihat bê ku Caklîna xwe bi bîne , di çiqîna nîvro de hat mala Hejar :

- Ez nizanim ci bi Caklîn hatiye , ez dikim dîn bibim , Ewî bi dil şewatî gote Hejar .

- Wê ci bi wê were ? dibe ku dîse ç.be Hisiça .

- Siba wê netîcên bekeloriya derkevin , û gereke ew neçe .

Roja din sibê , nîvro û êvarê ew di ber deryê Caklîn re derbasû , lê bê sûde .

Êvara çarê meha Tebaxê li ber deriyê dibistana (El-Urûbe) û li cadeyên dora wê xort gihabûn hev . navê serkeftiyan dixwendin , yê ku navê wî dihat xwendin ew pir kêf xweş di bû û berê xwe di da mala xwe da ku xeberê bighîne yên li mal .

Malêñ nêzîkî dibistanê xebera serketina zarokêñ wan digihişê wan berî ku zarok ji wan re bêjin , dengê xwendina navan di hat wan .

Ne Alan , ne Caklîn , herdû jî bi ser neketin , Alan serê xwe berda ber xwe û çû bi aliyê mala delala xwe de , tiq-tiqa Fayo û Hejar di kete guhê wî de , ewî serketina wan pîroz kir û meşîya , herdû tê gihiştin ku Alan bi ser ne ketiye :

- İnşalla sala bê tê ..

- Xema min ne şehade ye û ne duniya ye jî , ez di xwazim delala xwe bi bînim , Alan dev ji wanqueriya û bi tena xwe meşîya .

Alan çıxare bi dû çıxarê de di kişand , haya wî ji dunyayê tevî nebû , hişê wî li cem delala wî bû (tu li kîdê ye ? tu bi ser ketiye yan na ?) . Bê hemdî xwe çû tara (El-Mwezefîn) .

Li tara (El-Mwezefîn) cîran bi ser hev de diçûn di pirsîn ka kî serketiya û kî têk çû ye .

Alan gihişt mala Hejar û se3rê xwe tewand gava mervêñ Hejar li netîca wî pirsîn .

- Win di Karin bankin Hejar ?.

Hejar derket bi kêfxwesî û çû bi aliyê Alan de .

- Ka were ji box wedê bi min re bi aliyê mala Caklîn de . Alan bi dil şewatî gote Hejar .

Çawa herdû gihan ber deriyê wê dengê qerbalixê hat :

- Bese ji bo yesûs te xwişka xwe kuş ! dengê daiyka Caklîn ket guhê Alan .

- Ewî hat ku êrîşî mala wan bike lê Hejar ew sekinand :

- Tê bi kûve bi çe ?.

- Li delala min di xin !.

- Ma tu kiyî ku tu biçe wê xelas bike ?.

- Ez.. ez ..

- Li vêde bi sekine , Hejar destpêkir û çû ket hewşa mala Caklîn :

- Xêre ? ci bûye ? ewî pirsî .

- Ji bo yesûs Hejar tê Caklîn ji nav lepêñ birayê wê derxîne .

Hejar çû bi destê Xaço girt , gava Xaço dît ku ew hevalê wiye êdî sekinî .

- Xêre ? Hejar ji Xaço pirsî .

-Ew bi .. ser ne ketiye ! Xaço bi bîn çikandî bersiva Hejar da .

- Ma tê rabî wilo lê bikî ji ber ku ew bi ser neketiye ?!.

- Ne tenê ji ber wilo ! Xaço zimanê xwe girt , di vê gavê de diya wî çend kilînêkis danîn ber pozê Caklîn ku xwîna jê di hat bi sekinîne .

- Were bi min re derve , Hejar bi destê Xaço girt û çûn bi aliyê Alan de .

- (Lawê zinê ! Ezê destê te jêkim eger tu carek din li delala min bixe) , bi van ramanan Alan çû Xaço , lê Hejar bi nerînekê ziq lê nerî , Alan famkir û xwe girt .

- Tu şaşî ku tu li xwîska xwe dixe ji bo bekaloriye .

- Ne tenê .. Xaço xwe girt û ji xort xwest ku berê gotinê bi guherê .

bi bûre , Hejar peyvî , min hûn bi hev ne dan naskirin , Xaço .. Alan .

Xaço bi girinjîn destê xwe dirêj kir bi aliyê Alan de , Alan bi sarbûn destê Xaço hejand .

Xaço matmayî ma , destê xwe zû ji destê Alan kişand , (ma di be ku Caklîn navê vî mirovî di got ? .. na .. na , ne mumkine , ew musilmane , ew li kû û em .. na ..) , Xaço xatir ji wan xwest û bi lez vege riya mal .

Pîrka Caklîn ji zûde li cem mala lawê xwe dijî , ewê qet li ser jiyana xwe ji neviyên xwe re ne peyivî bû , neviyên wê jî tenê di zanîbûn ku pîrka wan li turkeyê çêbûye .

- Yabo ! Xaço bi qehir banker bavê xwe .

Pîrka wî lê nerî , di çavêن Xaço de eynî awirên cendirmên tirkan di dît , gava ku ketin hewşa wan dê û bavê wê kuştibûn û ew bi xwe hîn keçikek 7 salî bû û wê çaxê bazda û xwe di kozika mirîşkan de veşart , ewê dît ku leşkerên tirkan kuştina ermeniyan dîkin .

Pîrka Caklîn mabû matmayî , bê deng di wê kozikê de heta ber esir dema ku dayika hevala wê ya kurd Narîn di kir qîre qîr li ser mala cîranê xwe yên di nav xînê de mabûn , ewê çavê xwe li Sûzan gerand , tenê laşê dê û bavê wê dîtin .

Gava Narîn xwest derbasbe hewşa mala hevala xwe Sûzan bibe dayika wê bi acizbûn û bi girî bera wê da :

- Here malê ! .

Çawa navê Narîn kete guhê Sûzan ew bê hemdî xwe ji kozikê derket û banker :

Narîn .. Narîn !.

Dayka Narîn bazda bi aliyê wê ve û ew hembêz kir , û ji wê rojê de ew li wê mala kurd hate xwedîkirin hetanî ku xortek ermenî dît û di sala 1922 an de pêre zewicî û ji wir hatin bin xetê .

Yabo ! Xaço bi qêrînî banker , tu di zanî ku qîza te dil ketiye xortekî kurd ?!.

- Xortekî .. kurd ?! Bav bi matmayî li kurê xwe nerî .

- Erê .. navê wî Alan ne .

- Te çawan naskir ? bav bi acizî ji kurê xwe pirsî .

- Ev karê mine .

Pîrka Xaço û Caklıñ li kurê xwe û li neviyê xwe di nerî .

- Qîza min , ez hêvî di kim ku ev tişt ne rast be .

Bavê wê bi dengekî lerizandî ji qîza xwe pirsî .

Caklıñ zer bû , xwîn jip ozê wê nuqitî , ew rabû ser xwe , li xwîna xwe nerî :

- Erê raste ! .

- Çawa ? Qey tehişê xwe xwariye ! Bavê wê û diya wê bi acizî ev peyv gotin .

- Ez evîndara wî me , ew jî evîndarê mine ..

- Em û musilman ! Dayika Caklıñ peyivî .

Xaço rabû xwîşka xwe û şeqamek xurt lê xist da ku xwîn hîn bêtir jip ozê wê bê xwar .

Caklıñ bazda çû oda xwe û derî li xwe girt û dest bi girî kir . Li ber nigê wê nuqtêñ xwînê bêtir dibûn û nêzîkî hev dibûn . Ewê rahişt çend kilîniksan da ber pozê xwe û xwe rada .

- Bese lawo ! pîrka Xaço bi destê wî girt û pêde çû : bese , ji roja roj de tu li vê keçikê dixe .

- Ezê wê bi kujim , ew dil di keve yekî kurd , yên ku yek milyon û nîv Ermenî û File kuştine .

- Turkan em kuştin . pîrê jêre rast kir .

Turk û kurd .

Lê ne hemî kurd kurê min , pîrê pêde çû û xwedîkirina xwe li cem mala kurdan ji Xaço re got .

- Ji xwe pîrên wek te ku berevaniya kurdan dikan , û hîna tu bi Ermenî jî xweş nizanî bi axivî , tu bi zimanê kurdî di peyivê , ma ne şerme ji te re ?.

- Lawo ! pîrê gotina (Lawo) bi hisret got .

Xaço dehfek da pîrka xwe ew lie rdê xist . bavê Xaço bi serde rabû û lê qîr kir lê bê sûde .

- Ezê îrot e bi kujim ! Xaço li ber derî gote xwîşka xwe .

- Lawo bîna xwe fireh bike , emê iro wê bişînin Hisîça . diya Xaço ji kurê xwere got .

Di vê gavê de bîna Xaço hinekî vebû û bi acizî ji hewşê derket . Ew li paş vege riya û banker :

- Lê binerin , eger ez êvarî bêm û ez wê li vir bi bînim ezê zanibim çi bi kim .

* * *

Alan çû dikanê cem bavê xwe , çîroka xwe û Caklîn jêre got , lê ewî ne got ku ew Ermeniye .

- Başe , ew qîza kîye ? Ji kîjan malbatê ye ? Bav bi rûkenî ji kurê xwe pirsî .

- Ezê li malê ji te re bi bêjim .

- Başe , ji xwe re jinekê bîne ,û zarokan ji mere çêkin .

Alan bi birayên xwe û dê û bavê xwe re piştî xwarinê li salona mezin hinekî peyivîn , bav ji Alan pirsî :

- De ka bêje bê ma eva ku dilê te biriye kîye . Bavê Alan jê pirsî .

Alan li wan nerî , hinekî bê deng ma :

- Ew .. ew ..

- È .. ew çîza feqîrekiye ku tu wilô zû nabêje ? .

- Na .

- Lê çiman tu nabêje ?.

Alan ceger pêre çêbû û got :

- Ev heye salek an jî kêmîtir ku ez dil ketime keçek .. keçek .. keçek Ermenî de .

- Çima !!! tevan bi hevre bi yek dengî gotin .

- Erê , û ez di vim ku bavê min wê ji min re bi xwaze .

- Çi ! Ez herim wê bi xwazim ? Bavê Alan got û ew tiştê ku ewî bihîst bawer ne kir û bû tiq-tiqa kenê wî , lê gava Alan dîse ji wan re da xwiyanî kirin ku ew keçik Ermeniye , bavê Alan nema karîbû xwe bigire û dest bi ken kir :

- Wax .. wax .. ez .. ezê biçim keçek file û Ermenî ji lawê xwe re bi xwazim .. (Ya alem , ya hooo) , werin bi bihîzin ! Na .. na .. ez bawernakim tu henekan dike !.

- Yabo , ez henekan nakim . Alan yekser bersiva xwe da.

Alan rabû çû oda xwe û çend çıxare kişandin , birayê wî yê mezin li pey çû , li cem wî rûniş , destê xwe danî ser milê wî û jêre got :

- Alan , ew tiştê ku tu di xwaze pir zehmete , file û musilman ji hev re nabin , û çê nabe ji hev bînin , nexusim ji kurdan .

Çima? Alan bê hemdî ji birayê xwe pirsî .

Birayê wî çiroka fermaña fillan ji Alan re got . Alan serê xwe xiste ber xwe de , ji nişkave rabû ser xwe :

- Ma işê min û Caklîn ci bi fermanê heye ?.

Raste , lê ma ka ku millet jî vî tiştî fam bike .

- Yanî bavê min naçe wê ji min re naxwaze ? Alan bi acizî got.

- Tu çawa di bîne ku bavê te here keçekte fille ji lawê xwe re bi xwaze , ev tişt qet di nav milletê me de çê ne bûye .

Hîna gotina birayê wî di devê wî de bû Alan ji wir derket û bi acizî deriyê hewşê li dû xwe girt .

Dunya gerim bû , xelkê bajarê evînê pirê wan piştî xwarina giran di xew ve çûbûn . Alan li deriyê mala Fayo xist , Fayo derket û Alan destê wî kişand û ew derxiste cadê .

- Ka bavê te çawa diya te ya cihû revandibû ? yekser Alan ji Fayo pirsî :

- Xêre tu vê pirsê dike? .
- Ka tu ji min re bi bêje .
- Ka tu derbasbe hundur . Fayo ji Alan xwest .
- Na , meşe di rê de ji min re bi bêje , emê biçin cem Hejar .

Heta ku herdû gihiştin mala Hejar , Fayo bi kurtî çîroka bavê xwe yê musilman û diya xwe ya cihû ji Alan re got .

Rojekê bavê Fayo kemyona xwe dibe Helebê ji bo teslîhê , piştî ku wî kemyon xwe bi cî kir , daket û bi tena xwe di cada (Tîlal) de di meşîya . Çawa çavê wî li keçek ciwan , por reş , çav reş û mezin ket laşê wî lerizî ew bi dû wê de çû heta mala wê , her gav jî ew keçik li paş xwe din ere û bi wî re di gernije , gava keçik derbasbû mala xwe ewî li dora xwe nerî ku ew di tara cihawan de ye .

Çar meh derbasnebûn heta ku rojekê bavê Fayo û diya wî li tenişt hev û berê xwe dane Lubnanê .

Piştî ku temenê Fayo bû 5 sal ew hatin Qamişlo .

Di roja çêbûna xwîşika Fayo de diya wî mir , du sal bi ser de derbas ne bûn bavê wî jinek din musilman ji xwe re anî .

Hejar li ber derî bû gava ku herdû hevalên wî dihatin bi aliyê wî ve , Alan di zanî ku Hejar di çiqîna germê de bi wan re dernakeve û ji bo ku wî razî bike Alan ew xwestibû xwaringeha (El-Fursan) kir .

Çawa ewana li ser masekê , li xwaringehê rûniştin , Hejar ji Alan pirsî :

- (Ibnî) , ci dinavbera te û Caklîn de çêbûye dîse ? .
- Ne di navbera min û Caklîn de ye , lê di navbera min û ehlî min de ye .

- Xêre ?.

Alan li Hejar nerî û çîroka xwestina Caklîn jêre got .

- Lawo , ma tu dîn bûye ? ma çawa bavê kurekî musilman wê biçe keçek fille ji lawê xwe re bi xwaze ?.

- Ma tu jî wilô di bêje ? Alan ji Hejar pirsî û çavên wî firehtir bûn ji gotina Hejar .

- Erê , Hejar li Alan vegerand .
- Ezê wê bi revînim ! Alan bi dengekî bilind gote wan .
- Lawo dev ji vê keçikê berde , Fayo gotina xwe birî gava yê gerson hat .
- Ezê wê bi revînim , dîse Alan got , û ez alîkariya we di xwazim . Fayo û Hejar li hev nerîn , û dawiyê li Alan nerîn .
- Winê alî min bikin yan na ..

Dîse Hejar û Fayo li hev nerîn û dawiyê li Alan nerîn , Hejar bê deng ma , hate bîra Fayo revandina bavê wî ji diya wî re , ewî berî Hejar got :

- Ezê bikim .

Alan li Fayo nerî û li dora xwe nerî , gava çavê wî li çavê Alan ket got :

- Emê alî te bikin ! Hersê hevalan destên xwe dane hev .

* * *

- Xebîneta navê (Muhafeze = Parêzgeh) ku li bajarê Hisîça hatiye kirin , Hejar got û xwe daweşand , serê xwe bilind kir û tê gihişt ku hevalên wî mebesta wî ji vê peyvê fam ne kirin , ewî berdewam kir :

- Gereke Qamişlo (Parêzgeh) bûne .

- Bi rastî jî , Fayo dest pê kir , heyfe ev bajarê gemar û ne xwes parêzgeh be .

- Ez di çi de me û hûn di çi de ne , Alan gote hevalên xwe .

Herdû hevalan ji Alan fêmkirin û yek ser pirsâ ku mîjîyê Alan mijûl dikir pirsîn :

- Emê çawa mala xaltîka Caklîn nasbikin ? Fayo ji herdû hevalên xwe pirsî .

- Bi rastî jî emê çawa mala xaltîka wê nasbikin ? Hejar jî pirsî .

- Ezê bi şev û roj , rojekê du rojan , heftîkê , du heftiyan , mehekê .. ezê li mala xaltîka wê bi gerim heta ku ez wê zeft bikim .

- Niha tu ji dil vî tiştî di bêje ? Hejar bi qerf ji Alan pirsî .

Alan li Hejar nerî , li Fayo nerî , dawiyê got :

- Xebera Hejare , em ne edrêsa wan nasdikin ..

- Tiştê em di zanin ku mala xaltîka wê li tara filla ne . Hejar anî bîra herdiwan .

- Raste ! Alan banker û pêde çû , tiştékî dî hat bîra min , mala wan nêzîkî cada sitasyona (mihete) tirênen ye , yan jî ya rast ewe ku mala wan ne dûrî mihetê ye .

- Vaye me du nîşan ji adrêsa mala xaltîka wê derxistin ..

- Ezê îro yan sibe wê bibînim , Alan gotina Fayo qut kir û keniya .

- Dilê te delîlê te ye , Fayo bi erebî got . dunya hîna hênik bû , lê çend se'et ne bûrî bayekî sivik û sar rabû di vê meha payîzê de .

Pelên darêن cadan û yên xaniyan di cadê de li ber vî bayî sivik di çûn , gelek mirov di cadan de ne bûn .

Hersê hevalan destên xwe ji teksîyan re hildan lê şufér behitî di man gava ku li wan disekinîn û cihê ku di xwazin biçinê adrêsa wî qet nizanîbûn , ne navê cadê ne jî navê tarê ! Ewan guman dikirin ku ev hersê xort henekê xwe bi wan di kin .

Yekî ji wan şufêran ji wan re got :

- (Ya alem ya hoo !) hûnê çawa herin malekê û hûn tenê di zanin ku ew mal li tara filla ye ?

Hersê hevalan li hev nerîn , û ne gihiştin ku bersivekê bidin ji ber ku yê şufêr pê li banzînê kir û bi xurtî ajot .

- Bi rastî xebera wiye , Hejar gote hevalên xwe .
- Başê , em bi kûve bi çin ? Fayo li ser axaftina Hejar pirsa xwe zêde kir .

Alan li Fayo nerî û peyivî :

- Ka em herin xwaringehekê taştê bi xwin .

Hejar sist bûbû ji birçîbûnê , lêvên wî ziwa bûbûn ji tî bûnê , û gava Alan daxwaziya xwe got Hejar yekser got :

- Meşin !.

Fayo teksiyek sekinand , hersê siwar bûn û ji şufêr re gotin :

- Ji kerema xwe re me bibe hundurê bajêr .
- Kudera hundurê bajêr ? şufêr pirsî .
- Ji kerema xwe re me bibe xwaringehekê , em dixwazin Fûla bi xwin .

Şufêr Hakob yê ku qama wî bi zor digiha derkisyonê li wan nerî û ji wan pirsî :

- Birazê , xwiyyaye hûn ne ji Hisîça ne .
- Na , em ji Qamişlo ne .
- Ser seran , ser çavan , (Subhanallah) , ez derketim vê sibehê da ku ez herim hinek Fûl ji zarokên xwe bi kirim .
- (Subhanallah) , Fayo got û devê wî ji hev ma li ser vê li hevhatinê .
- Kîjan cî xweştir Fûlan çêdike ? Hejar ji Hakob pirsî .
- Birazê , ez we bibim cihkî ku hîna we Fûl wek yê wî xweş ne xwarine .

Hîna peyva wî di devê wî de , ew gihan xwaringeha (Toros) ya Fûlan , Hakob ji makîna xwe ya şovêrlê 59 daket û da pêşıya xortan .

Hersê xortan bi zor karîbûn ji xwe re maseyekê û sê kursiyan bigirin , maseyên din dagirtî bûn .

- Sisê (Fûl) bîne ji van xortê delal re , Hakob ji Toros xwest û çû cem wî ji xwe re bi peyivin .

Sêniķen Fûlan hatin , libêñ hinaran bi ser de werkiribûn .

- Ev cara yekemîne ku ez Fûlê bi hinar di xwim , Hejar peyivî û dest bi xwarinê kir .

- Oxxx .. bê çiqasî xweşe ! Fayo bi mirçe mirç ev gotin ji devê xwe yê tije derxist .

Alan rabû gava dît ku Hakob wê heqê Fûlên xwe bide :

- Keremke apo , ev heqê gihadînê , heqê Fûla jî ezê bi dim .
- Na , heqê gihadînê ezê bistînim , lê yê Fûlan qet ez qebûl nakim tu bide .

Piştî hinek xire cir Hakob li ber daxwaza Alan nerim bû û got :

- Ez qebûl dikim bi şertekî .
- piştî xwarinê win bêñ cem mala ezê qedehek qehwe bi dim we .

- Heger wilo be em şertê te qebûl dikan .

Hakob xatir ji wan xwest û li şevirolê siwar bû û ajot , lê piştî çend metran ew daket û vege riya hundurê xwaringehê :

- Min ji bîr kir ku adrêsa xwe bidim we , lê piştî nîv se'etê ezê bêm we bibim .

- Ka çixarek bi de hevalê xwe , Hejar ji Alan xwest , ewî dayê , Fayو jî yek xiste nav lêvên xwe , dilê Alan bi rengekî xurt lê di xisit , ruyê wî sor bû , û ma bê deng .

- Me navê vî şufêri nasnekir . Alan ji hevalên xwe re got û dîse kete bê dengiya xwe de .

- Navê wî yan Ehmede , yan jî Mehmûde . Hejar got .

Hersê heval keniyan , û hîna çixara xwe xilas ne kiribûn heta dîtin ku şivrola şîn li pêşıya xwaringehê sekinî .

Hakob serê xwe ji pencera makîna xwe derxist û banker :

- De heydê bi lez .

Fayو li cem şufêr rûnişt , Alan û Hejar jî li dawiyê .

Çend cade derbas kirin , ji nişka ve Hakob teksîya xwe sekinand û peya bû .

- Em gihiştin mal ate ? Fayو ji Hakob pirsî .

- Belê , Fermo bi kin .

Çawa Hakob mîvanêن xwe derbas kirin oda mîvanan , ew bi Ermenî bi pîreka xwe re peyivî , jê xwest ku qehwê çêbike .

- Kuro lawo we bihîst ? Hejar ji hevalîn xwe pirsî , ew bi Ermenî peyivî .

- Na lo !!! Alan matmayî dengkir .

- Bi xwedê , Hejar li Alan vege rand .

- Mala xwedê ava ku me pirsa mala xaltîka Caklıñ jê nekir , Fayو bi dil xweşî û bi dengekî nizim gote hevalên xwe .

- Erê bi xwedê , lê ew bi kurdî xweş dizane bi peyive te di go qey ew kurd de , Hejar nerîna xwe bi serbilindayî got .

Mala Hakob li tara Filla bû , di qebwekê de bû , ev mal ji sê odan û salineke mîvanan bû , hîna xweşik boyax ne kiribûn .

Hakob derbasî cem mîvanên xwe bû , gava ku dît se'et bû neh ewî radiyo vêxist û danî ser BBC ya erebî , Radyo li qozîka salonê bû , çend kenebe di salonê de hebûn , Hejar li ser keneba piçûk ya li ber derî rûnişti bû .

Çawa derî vebû Alan bê deng ma û zer .. zer bû ,

çawa çavê Caklıñ li Alan ket qedehêne qehwê hemî ji destê wê ketin û yek ji wan qede han li ser Hejar ket , qîrînekji Hejar derket ji ber gerim bûna qehwê , rabû ser xwe , lê ew jî bê deng ma gava çavê wî li Caklıñ ket , Caklıñ dest ji her tiştî berda û vege riya oda din . Hakob bi lez çû av anî û bi ser pantelonê Hejar dakir bi ziq mabû .

Hakob çû kete metbexê û derî li dû xwe girt :

- Ma Lena ne li malê bû ku te sênîka qehwê da destê keça xwiha xwe ya dehbe da ku bîne hundir ? Hakob bi qîrîn gote jina xwe .

- Ma ezê çawa bi kim ? Lena çû qedemgihê û min jî şerim di kir ku ez bi vî kirâsê razanê werim hundur . jina Hakob bi vê bersivê ew hinekî nerim kir .

- Ka zû qehweke din çêke .

- Xêre , ci bûye ? Lena bi dengekî nizim pirsî û çû oda xwe û dît ku çawa Caklîn di lerize û di girî .

- Xêre , ci bûye ? Dîsa Lena ji Caklîn pirsî .

- Ay .. ay Lena , tu di zane bê kî li vire ? Ma tu nizanî bê dilê min çawa lê di xe ?! Evîndarê min A..l..an li vire !.

- Na ! .. tu bi rastî di bêje ?

Çavêن Alan kelo girî bûn û çıxare bi dû hevde di kişand û bê deng mabû .

Tevî ku Hakob lêbûrîna xwe ji wan xwest , lê ew mabû bê deng û nerînên wî ziq bi aliyê derîve mabûn .

Lena bi dest lerizîn qedeха qehwê li ber Hejar , Fayo û Alan danî , Hejar û Fayo sipasiya wê kirin , lê Alan tenê deynekir û lê nenerî .

Ji nişkave ew rabû ser xwe û derket , hevalên wî jî li dû wî rabûn .

- Xêre , zû ye , hê we qehwa xwe ne venexwariye , Hakob ji wan xwest .

- Na , em .. emê herin , karê me heye , Fayo bi lez got û derket gihişte Alan .

- Qusûra me ne nere apo !.

Hejar bi lez ji Hakob re got û bêyî ku li dû xwe bi nere , ewî lezand bi aliyê Alan û Fayo de , yên ku bi gavêن mezin di meşyan .

Ji helk-helkê Fayo destê xwe danî ser milê Alan da ku wî bi sekinîne , lê .. bê feyde .

Alan bê hiş di meşya û bi xwe re Fayo jî di meşand .

- Delala min Cako .. ha .. ha! Bê konsentra Alan di ber xwe de di peyivî û serê xwe di hejand .

- Alan ! Fayo ! , Hejar banker û pêde çû , bîna min çikiya !.

Hejar kete pêşîya Alan , Alan destê xwe danî ser sînga wî :

Hejar ! ez nikarim bawer bikim .. ewa li ber min Cakê bû . bêyî ku bi peyive Hejar serê xwe bi erê bûnê hejand . Alan li dû xwe nerî , çavên wî li Fayo ket , her Fayo jî bi erê bûnê serê xwe di hejand . Alan sor bû lêvên wî lerizîn :

- Cakê .. ya rebî .. ez kêfxweşim .. ez şahinşahim , delala min Cakê ..

Alan ev gotin digot û destê wî li ezmana , kesên ku di ber wî re di çûn bi matmayî temaşa wî dikirin .

- Hunê alîkariya min bikin , Alan berê xwe ji ezmana da hevalên xwe û sipasiya wan kir gava ku wî dît ku hevalên wî destêن xwe xistin nav destêن wî .

- Emê çi bikin? ji me bêje Alan , Hejar jê pirsî .

Çavêن Alan ji Hejar çûn bi aliyê Fayo de û peyivî :

- Wek ku bavê vî zilamî , pîreka xwe , diya Fayo , ya cihû revand , ezê jî..

- Tu di zanî bê tu çi di bêje ? Fayo bi tiris û dengekî lerzî ji Alan pirsî .

Alan têgihişt ku Fayo hevalê xwe di bîne ne li gora revandinê ye , ji ber ku gava bavê Fayo dayika wî revand , temenê bavê wî 40salî bû .

Alan piştî xwe rast kir û him-him ji zengelorka xwe anî , da ku dengê xwe zelal bike :

- Qey ez nakevim çavêن te de ? .

Dunya sartir di bû gava hersê hevalan dane rê , hersê heval keniyan , ewana ji Husîça ta bi Qamişlo di peyivên bi dengekî nizim dê çawa wê wê bi revînin .

Gava ewana gihan mala Hejar , ew hersê li tarê û li derê mala Caklîn di nerîn , ji pencera oda mîvanan ya mala Hejar .

Tevî ku se'et şesê êvarê bû , duniya tarî bûbû , cade tarî di bû ji ber ku di wê cadê de tenê sê çira vêketî bûn .

- Di nerîna min de , ez li vir bim , kontirolê bikim ka kî li wir heye . Hejar dest bi şirûve kirina pilana xwe kir . Alan jî ya xwe got , Fayo yê herî dawî bû û ew jî pilana revandina bavê wî ji diya wî re bû xweş pilan ji revandinê re .

- Raste, fikra te xweşe , lê di dest pêkê de min bi nerîna xwe bingeh ji pilana Fayo re danî , Hejar peyivî bi serbilindî û bi bawerî .

Alan û Fayo li wan nerîn , ji ber wext tengbûnê ewan bersiva Hejar ne dan di dest pêkê de , lê gava Hejar gotina xwe berdewam kir , Fayo peyivî :

- Malneketo , tuştek di navbera pilana min û ya te de wek hev tune ye ji xeynî ku wê çavê te li mala Caklîn be , ka kî tê û kî di çe ..

- Wilo win qenciya min lie rdê di xin , Hejar bi xeyd peyivî û berê xwe da aliyê din .

Alan li ber dilê Hejar da , çend gotinê xweş jêre gotin , bi razî bûna Hejar , Alan û Fayo li ber derî xatir ji Hejar xwestin , gava wan pişta xwe dan Hejar ewî banker herdû hevalên xwe .

- Wî , mane Caklîn li Hisîça ye !.

- Erê , ma nee m niha ji wir hatin , Fayo bi qeşmerî li Hejar vegerand û herdiwan pişta xwe dan wî û keniyan .

- Sibe li hêviya me be ! Alan ji Hejar xwest .

Hejar wê şevê bi serbilindî racket (ku ne ez bim Alan û Caklîn na gihin hev .. ezê sibe wê ji hevalê xwe re birevînim .. gerek Alan û Caklîn navê lawikê xwe bikin Hejar ..) , bi van gumanan û bi girinjîn Hejar kete xewê de .

Çawa Alan gihişte mal , ew çû oda razana dê û bav û xwîşkên xwe , demança bavê xwe xiste ber xwe de û çend hezar ji berîka bavê xwe

dirxistin dema bavê wî raketî bû , çû mala Fayo , ew siwar kir û çûn bi alî mala Hejar ve .

Hersê heval li tekisiya şoferê ya bavê Alan siwar bûn û berê xwe dan Hisîça .

Feysel ji zûve bûbû şufêrê bavê Alan , ew dirêj û gir bû porê wî kizirî û çend mûyê sipî di nav de heybetek dida wî .

Alan ji Feysel re gotibû ku dayika wî li hisîça ye , û ew û hevalên xwe wê herin wê bînin û wê werin .

Feysel jî ji dil paqîjî û ji fediya ewî tu pirs ji Alan ne kir , tenê li siheta bavê wî pirsî , hersê heval û şufêr bê deng mabûn .

Carnan tîrêjên rojê xwe bi şan didan , lê dunya sar bû .

Çawa ew gihan Hisîça , ew bi xwe jî nizanin , hemî bê deng mabûn , ji xeynî vê deqa gava ku Alan liufêr nerî û ya dilê xwe jêre got .

Feysel firêm girt , zîqînî ji dûlabê makînê hat :

- Aniha tu bi rastî di bêje ?!

- Alan li ruyê Feysel nerî û dît çawa bûye wek rengê leymûnê .

- belê , tu be ..

- Ma di fikra we de ev leystika zaroka ye ?.

- Na .. ya zilama ye , Hejar bersiv da û keniya .

Ronî di çavên Feysel de nema , ew ji tekisiya xwe derket û Hejar jî bi xwe re derxist û bi xenaqa wî girt .

- Ay .. te ez fetisandim ! bi zorê Hejar peyivî û bîna wî di çikiya .

- Bese , dev ji hevalê min ber de , Alan destê Feysel ji xenaqa Hejar derxist û rica kir ku ew biryara xwe bide :

- An tê were alîkariya min bikî , yan jî perê xwe bigre û here .

Feysel pere ji destê Alan girtin û zû xistin berîka xwe de da ku peşkên baranê li wan ne keve .

Baran xurt bû û Feysel pişta tekisiya xwe da hersê xortan û bajarê Hisîça û ajot bi aliyê Qamişlo de .

Hersê heval xenaqa hev , her yekî ji wan lom ji yên din dikir .

- Min zanîbû ku serê wî yê bê namûsa ye , Hejar bi qehir ev gotin li ser şufêrê bavê xwe ji Alan re got .

- Û destê wî yê egîda ye , Fayo bi tîq tîq got , Hejar destê xwe da qırka xwe bi kufriya çû Fayo .

Alan ket navbera Fayo û Hejar de :

- Bese em hatine tiştekî giringtir . Alan armanca hatina wan anî bîra wan . baran hûr di baruya , basêni piçûk zû di ber wan re derbas di bûn .

Teksiyek zer li pêsiya wan sekînî , hersê heval siwar bûn .

- Ah ! .. Feysel ! hersê hevalan bi yek dengî bankirin .

- Em herin bi kû de gava ku em wê bi revînin ? Feysel ji Alan pirsî û ziq li wan nerî .

Alan bi dorê li hevalên xwe nerî û bê deng ma çend deqan , dawiyê dîse Feysel pirsî :

- Ma win hîn nizanin hûnê kuve bi çin ? .

- Şam , Fayo ji divla Alan re gote Feysel .

Baran sekinî bû gava ku hersê hevalan ji teksiya Feysel daketin , Hejar di cada Hakob de çû û hat , ewî işaret da Alê û Fayo gava dît ku kes li dora xanî tune ye , ew li ser cadê sekinî , Feysel di hundurê makîna xwe de rûniştiye , li aliyê din Fayo û Alan ketin (Qehwa) , mala Hakob de .

Ale işaret da Fayo da ku di bin derencan de rûne û çavê wî li ser deriyê derbaskirinê be .

Alan xwe tewand û hêdî hêdî meşîye , ew giha pencera (Metbexa) mala Hakob .

Gava Alan serê xwe bilind kir û kir piste pist da ku Lena wî bi bîne , lê gava diya Lena derbasî (Metbexê) bû Alan bi lez serê xwe daxist .

Çend caran wilo kir , heta cara dawî Lena bi dengê wî hisiya , Lena hate ber pencerê û Alan bi dengekî nizim peyivî :

- Lena , ji Cakê re bêje , va ez li hêviya wê me , ezê wê birevînim .

- Ev tu bi kî re di peyivî ? dengê diya Lena Hate Alan , ewî yekser xwe dûrî pencerê xist .

- Dengê cinan qey hatiye te ? Lena bi henekî gote diya xwe .

Gava diya Lena dît ku kesek li nêzîkî pencerê tune ye ewê serê xwe hejand û çû oda xwe , çawa ew derket Lena bi lez çû pencer vekir .

- Lena ! .

- Ha .. ha .. Alan .

- Te ji Cakî got ? zû jêre bêje .

Girî kete qırka Lena , ew çend deqan bê deng ma , serê xwe hejand :

- Caklıñ birin malê , û yekser sibê daweta wê ye .

- Ci !! Alan kire qîrîn , lê zû destê xwe danî ser devê xwe .

- Hiş !! Lena bi dengekî nizim ji wî xwest .

- Ez hatibûm wê birevînim .. ah..

- Hiş ..

- Lena , gerek tu xeberê bidê wê ku ezê wê bi revînim , ku ew li ser kursiyê dawetî jî rûniştî be !.

Lena ma bê deng .

- Lena ! tê alîkariya me bike ? .

Lena serê xwe hejand û hêsisir ji çavê wê bariyan .

Alan bi xurtî deriyê teksiyê li dû xwe girt , bi xurtî jî kûfrî dikir .

Dunya tarî di bû wek tarî bûna dilê Alan û Caklıñ , baranek xurt bariya gava Feysel berê teksiy xwe da Qmişlo .

Li serdaxwaziya Alan , Feysel teksiya xwe hinekî li dora mala Caklıñ hinekî ajot , baran xurtir bû , û li cadê n ekes û ne kûs !!.

Feysel berê xwe mala her yekî ji wan , mala Alan ya dawî bû , Feysel destê xwe danî ser milê Alan berî ku dakeve :

- Di kîjan rojê de , kîjan se'etê de ez di xizmeta te de me , û hevala te ji bilî vê teksiyê de ew nayê revandin .

Van gotinê Feysel hunekî dilê Alan xweş kîrin :

- Sipas , Alan gote Feysel û herdiwan destê xwe dane hev .

* * *

Her li ser eynî vê cada evîniyê Alan cara yekem Caklîn dît , erê li ser eynî vê cada evîniyê , du malên xwedê hatine avakirin , Kenîsta filla , û ji wê bi wired Camiya musilmanan .

Zilam û pîrekênu ku hatibûn Kenîstê , bi teqmênu xwe yên reş û qemîsênu sipî û girafêtênu ciwan li wan bûn , pîrekan jî kirâsênu xwe yên herî ciwan li xwe kiribûn .

Çawa Lena û Caklîn ji teksitê daketin , çavênu wan li Alan ket , yê ku li qozîka cadê sekinî bû , lêvên Alan û Caklîn ji hev dû vebûn û kenîn , li hewîr dorê Caklîn pîrekan di lîland , deng ne di çû Caklîn , ji nişkan ve destê Caklîn kişandin hundirê kenîstê ve .

Hejar û Fayo li ser cada Medresa (Xezalî -El hûrûriye)sekinî bûn , Feysel jî di tekciya xwe de rûniştî bû , di cada (Kenîsta El-Ermen) li ber deriyê piçûk yê kenîstê .

Baran hêdî hêdî di barî û bayekî sivik li ruyê Alan di xist .

Salona Kenîstê tijî Alem bûn , Caklîn kirâsê xwe yê bûkaniyê li xwe kiribû , Zava jî li tenîstê sekinî bû û her ku wî li Caklîn di nerî lê hayê Caklîn ji wî tune bû .

Caklîn li Paş xwe nerî dema ku keşe gotinê xwe yên zewacê di gotin . dengê keşe ne di çûyê , ewê ziq li pîrka xwe nerî û dît çawa lêvên wê di livin bi gotin , ji wê livandina lêvan Caklîn gotinê pîrkê tê di gihişt :

- (Ya reb ! ya yesûs ! tu miradê qîza lawê min bike bi Alan re , wek dilê hemû dilovan xweş bike gava di gihêne hev .. weke ..).

- Caklîn Asadoryan , tu Zohrab Dîkran qebûl di ke wek .. Keşe got û bi nerînek nerim li Caklîn nerî .

Rûyê Caklîn sor bû , lêvên wê lerizîn , peşkênu xwînê hêdî hêdî jip ozê wê dilop kirin li ser kirâsê wê yê sipî .

Lena destê Caklîn girt berya ku ew bikeve , ew derxist derive .

Gava bav û diya Caklîn jî derketin Caklîn ji wan xwest ku vegezin hundirê kenîstê . Beriya pîrê bi wana re ew çû li ber senemê yesûs û xaçê sekinî :

- Sipas yesûs .. !.

Pîrê li ber deriyê destanê ma li hêviya Caklîn û Lena . bûk dîse çû ma keşe , bi alîkariya pîrka xwe , pîrê di keniya û dil xweş bû , her wisa bîna hemî mazûvanan derket gava ku bûk bi selamet vegeziya hundirê kenîstê .

Bav û diya Caklîn rûgeş bûn gava dîtin qîza wan bi bawerî gavênu xwe ber bi keşa ve tavêje .

- Ka Lena li kû ma ? diya Lena ji bavê wê pîrsî .

- Hiş ! bavê Lena îşaret da dayika Lena .

- Qîza min tu dikare zohrab qebûl bike wek mîr ?

Keşe ji bûkê pirsî , wek cara din lê vê carê xwîn jip ozê bûkê ne hat .

Guh û çavên mazuvanan ma li bendî devê bûkê .

Bûkê serê xwe bi erê bûn hejand . gava zava şâsika li ber çavê bûkê rahişt ew yekser ji kenîstê der ket :

- Xêre îro wilo di be ! zilamekî kal wilo got , ew li rêza pêşîn rûniştî bû .

Gava bûkê berê xwe da mazûvanan hemiyan bi dengekî gotin wax!!!.

- Lena ! diya Caklîn bankir û dilê wê êşıya , hemî mazûvan têde gihiştin ku Lena ciyê Caklîn girtibû û kirâsê wê yê bûkaniyê li xwe kiribû .

* * *

Alan û delala xwe li paş rûniştibûn , Hejar û Fayo li teniştâ Feysel cî girtibûn .

Bi tiq tiqa kenê wan , serê şeveqê gihan şama şêrîn , rokê hêdî hêdî xwe belav kir tev şewqa xwe li ser şamê , te di got qey kes li vî bajarî nemaye , tenê ev her pênc kes bûn .

Ev bajar vê şeveqê li ser hesabê van pênc kesan mabû , ne xasim li ser hesabê van herdû dilovanan .

Alan çavê xwe vekir û li delala xwe nerî , ewî li wê nerî û nerî , tiliyên xwe di nav pora wêre birin û anîn , li ser riwê wê yê miliyaketî bir û anî heta ku tiliyên wî gihan ser lêvên wê :

- Delala min Cakî .. roniya çavên min Cakî .

Cakî lêvên xwe ji hev vekirin û tiliyên Alan ramûsandin bêyî ku çavê xwe veke .

Herdû lêv gihan hev , bîna wan her û her bêtir di çikiya , gerim bûna herdû laşan zêdetir bû , û çıkışkîn Cakî sist bûbûn wek du gilokên pembû .. herdû bi hevre derketin azmana û weha jî daketin erdê .

Gava xilas kirin , Alê hêdî hêdî lêvên xwe birin û anîn li ser laşê delala xwe .

Çavên wî li derive ket , dît ku şewqa şeveqê bêtir heye ji şewqa beriya vê şevê ! Ew rabû şîlvî tazî û çû ber pencerê , ruyê wî geş bû gava çavê wî li berfê ket .

- Berfa sipî û delal , bê hemdî xwe ev gotinê han ji devê wî derketin .

- Alan li pişt xwe nerî dît ku çawa delala wî li nav ciya wek zarokekê nû ji diya xwe re çêbûyî razaye .

Çixara xwe vêxist û nefesên dirêj kişandin , di vê oda wan de ya piçûk dûmanâ çixarê zû belav bû .

- Were raze ! dengê Caklîn yê ziwa hişt ku Alan berê xwe bide delala xwe :

- Na , tu rabe , were ji xwe re bi nêre .

- Xewa min tê .

Caklîn , we re li berfa sipî û ciwan temasé bike .

- Berif !.

Caklîn , xwe çend kir ji ser textê xwe , berê xwe da Alan :

- Bi rastî berfe ? .

- Bi hesreta me bû , Alan peyivî , ku me hinek berf bidîta li Qaişlo û niha ..

- Niha maşella çiqas berif , . çiqas ciwan û sipî ye . Caklîn peyivî bê ku fambike Alan ci got .

Alan demekê bê deng ma , ji nişkan ve pirsek hat bîra wî :

- Ev çiqas çêbûye ku em hatine Elmaniya ? .

- Nizanim .. du heftî yan .. bese .

Caklîn çû li masa nêzî text nerî dît ku gulek sor di avê de ye û sê gulên din yên sor û ziwa li teniştâ wan , ew bi lez vegeriya cem delalê xwe û got :

- Ev bûye nêzîkî meheke me .

- mehek !.

- Erê .

- Ci zû wext di çe . Alan ma bê deng û hê jî li berfê din ere û dawiyê ji Cakî pirsî :

- Lê te çawa naskir ku mehek bûriye ?.

- Ji gulên sor yên ku te ji min re tanîn . Cakê bersiva xwe û hinarênu ruyê wê sor bûn.

Gulên sor yên ciwan ku mirov bide delalên xwe . rojekê Alan bi tena xwe çû sûka bajarê xwe li Birêmin , çavê wî li xortekî Elmanî ket û gulek sor di destê wî de . Alan ma û li vî xortî nerî , dît ku keçek dirêj hat û ew himbêz kir , û ji wê rojê de her yekşem Alan gulek sor diyarî delala xwe di kir . her se'et , her roj Alan û Caklîn destên di destê hev de di meşyan , her tim bi hevre bûn .

- Were li van herdu kesan bi nere , Şêrîn gote Menal . Menal bi acizi hat li ber pencerê sekinî û dît ku xortek û keçek lepêñ berfê tavêjin hev , û pêde çû :

- Ji roja ku ev herdû hatine vê kampê ew bi hevdûre ne .

- Bese , tu çavnêra xelkê yî ?! Menal bi acizi gote jina xwe .

- Ez! Şêrîn bi matmayî li mîrê xwe vegerand .

Şêrîn pencer vekir , bayekî paqij û hînik sînga wê tijekir .

- Pencerê bigre min sare ! Menal ji Şêrîn xwest .

- Bi xwedê erebiya wan weke yam eye !.

- Ji ku deng hatiye te ? Menal bi ziq li pîreka xwe nerî û pirsî :

- Çawa deng nayê min ?.

- Ez dibêjim belkî te ji bo wilo pencer vekir .

Şêrîn li pişt xwe nerî û pencer girt û çû mantoyê xwe li xwe kir .

- Bi kû de ? Menal pirsî .

Şêrîn bê ku bersivê bi de û bi ûft-ûft ji odê derket û derî bi xurtî li dû xwe girt .

Menal û Şêrîn zarokê apê hev bûn , ji dêrikê ne , ev bûbû salek li Elmaniya di vê kampê de bê (îqame) .

Hîna Menal ne gihabû çavê xwe gerim bike , ji nişka ve derî vebû û dengê Şêrîn dihat ku di bêje derbas bibin , carnan bi kurdî carnan bi erebî .

Menal rabû ser xwe û devî wî ma ji hev vekirî :

- Ela .. (Ehlen û sehlen) Menal bê madê xwe xêr hatin da wan , ew rabû çavê xwe şûst û dawiyê li ser text , li teniştä pîreka xwe cî girt , li hember herdû mîvanêñ xwe yên ku li ser du kursiyan rûniştibûn .

- Ev Caklîn û Alan ji Qamişlo ne , û Şêrîn berê xwe da mîrê xwe : ev jî Menal mîrê mine .

Gotinê hev kişand û civata wan xweş bû , Caklîn hinekî bi aliyê gurçika xwe girt û ji Şêrîn xwest ku herin cihê destavê .

- Kûde te dêse ? Şêrîn pirsî .

- Ji zûde gurçikên min ne êşiyane ..

- Gereke haya te ji te hebe , li vir sare .

- belê .. Caklîn bi kurtayî bersiva xwe da û kete qedemgihê de .

Caklîn ji zûde gurçikên wê dêşîyan , hîn gava piçûk bû , ev jî ne cara yekeme ku li Elmaniya di êşe .

Ji ber êşa gurçikan ew gelek caran di giriya . gava Alan di pirsî çîma ? ew di girî û di got :

- Ez bêriya dayika xwe , pîrka xwe , bajarê xwe dikim . bersiva wê ev bû , lê ji bo ku Alan çherî ne kişîne ew li pêşıya wî nema digiriya û kenek ne rast li ser rûyê xwe yê ber bi zerbûnê ve di çû datanî .

Her ku wext di bûrî duniya li bajarê Birêmin sartir dibû , tenê gava berif di hat ew sema di şikand , lê gava gava roj derdiket , berfê di çîrisand , ezman safî di bû .. wax ! mirov ne di karîbû derkeve derive .

15 ê meha çiriya paşî Alan bankir Menal û Şêrîn da ku meha didiwan ji hatina wan bo Elmaniya şahî bi kin , ji bo gihadina wan hev bi serbestî , li vî welatê serbest .

Şêrîn û Menal nizanîbûn munasebet çiye , ew dest vala hatin mala Alan , herçar li dora masê rûniştin , Alan û Caklîn xwe xweşik kiribûn , cilêñ nû li xwe kiribûn .

- Wax! tu di bê qey îro nû daweta we ye , Menal matmayî ji herdû sitêrikên evîndariyê re got , herçar kenîyan û Alan qedeха xwe ya tijî wîskî hilda û peyivî :

- Min û Caklîn we xwestiye işev ji bo roja dû mehiya me bi hevre , û çend roj kêmter ji wê ji bo mana me li Elmaniya .

Menal û Şêrîn li hev nerîn :

- Pepûk ! em dest vala hatin . Şêrîn di ber xwe de got Menal yê ku royê wî ji fedya sor bûbû .

- Qisûrê menerin .. Menal lêbûrîn xwest , lê Alan peyva wî birî :

- Hatina we li hember diyariyekê ye .. Alan gote Menal .. û şahiya her çaran berdewamkir bi dil xweşî .

Caklîn rabû ku rahêje xwarinê û mêwe deyne , ew çawan rabû hinekî gêj bû , destê xwe da ber devê xwe û bi lez berê xwe da qedemgehê , Şêrîn bi dû de çû .

Alan rabû ser xwe :

- Xêre , xêre !!.

Şêrîn ew ji hemamê derxist û derî li ber girt .

- Pîroz be birako , pîreka te hemleye , Menal bi bawerî gote Alan .

- Na .. devê Alan ji hev ma .

- Birako ez xwedî tecrube me , Menal gote hevalê xwe û destê wî girt û hejand :

- Pîroz be !.

Alan nikarîbû ji guhê xwe bawer bikê :

- Ew hemleye !.

Ji nişkan ve Alan keniya û rabû kasêta (se'îd yûsiv) xiste musecelê de û dîlan kir !.

Di vê demê de Şêrîn hêdî hat Caklîn danî ser text , rengê ruyê Şêrîn û yê Caklîn ne xweş bûbûn .

Ji kêfa , ji giranbûna serî û ji dengê mûzîkê Alan û Menal dîlana xwe berdewam kirin .

Şêrîn hat tayîp vemirand , herdû zilaman li wê nerîn :

- Yawobihêle hinekî em kêfbikin , Menal bi zimanekî giran ji Şêrîna xwe xwest .

Çawa çavê Alan li Caklîn ew bi gavêne giran çû cem wê , destê xwe xiste destê wê û aniya wê maç kir .

- Delala min te çîma ne digot min? .

- Caklîn li Şêrîn nerî , Şêrîn milê xwe bilind kir .

- Ezê .. min ne .. di xwest , devê Caklîn ji hev ma û rengê wê zertir di bû , laşê wê gerimtir di bû .

- Te çîma ne digot ku tu hemleye ? Alan bi giranî gote wê .

Caklîn destê Alan bi xwirtî hembêz kir . di vê gavê de Menal Alan kişand da ku Şêrîn di tenîsta Caklîn de rûne .

Herdû xort çûne ber pencerê û çixare kişandin , gava pencer vekirin bayekî sar li ruyê herdiwan xist , Alan sînga xwe jê tişekir .

- Çiqas ev ba bêna mirov derdixe ! Menal bi çavêne girî û bê ku li Alan temaşe bike jêre got .

- Cak.. Caklîn !! Alan bi xemgînî di ber xwe de got .

Şêrîn kire qîrîn .

Alan çixara xwe wek Menal ji pencerê avêt û hat bi aliyê jaklîn ve .

- Caklîn , delala min ! Alan bang kir .

Caklîn wek laşekî bê can li ser text paldayî bû .

Di wê şevê de (Ambolans) ê Caklîn bire nexweşxanê . Alan û Menal jî bi wan re çûn .

Tevî ku Menal Elman gelekî nizanîbû , lê ewî ji (mumeridê) tê gihişt ku gurçikê Caklîn sekinî ne û hemlbûnê tendurista wê xerabtir kiriye , Alan heme çavên wî li Caklîn û li (mumeridê) bû .

Kîsê oksîcînê li ber devê Caklîn bû , riya nexweşxanê dirêj bû , baranek xurt ji erd û azman dibařî hişt ku şifêrê Ambolansê hêdî hêdî bajoyê .

- Law jêr bêje da ku xurt bike . Alan ji Menal re got da ku bi Elmanî ji şifêr re bêje .

- Bêna xwe veke Alan , ma qey tu nabîne ? Menal bi acizî li Alan vegerand .

Baran bêtir xurt di bû û carnan enterîkên tirumbêlê peşkên baranê didan xwiyakirin , wek hêşirên çavan , wilo diyar di bûn .

Alan bi ziq li wan libêñ baranê temaşe di kir gava Caklîn şîn bûbû , bê deng , bê vîn , bê nefes .

Ya mumerîde bi Elmanî gote Menal ku Caklîn çû ezmanê xwe dê .

Menal bi çavêñ hêşir kirî destê xwe danî ser milê Alan û got :

- Serê te sax be !!.

- Alan demekê ma bê deng , çavêñ wî li libêñ baranê bûn , gava ku turimbêlêñ li dû ambûlansê li pêşıya wê dixistin Alan di ber xwe de di got :

- Na .. na .. neçin .. runiya lempêñ we libêñ baranê ronîdikin .. ji bo xwedê li pêşıya .. ha..ha..ha mala xwedê ava vaye turumbêlek din li paş me ye , lê ji bo xatirê şeytan li pêşıya me nexin !.

- Alan .. Alan .. tevî ku Menal dengê xwe bilind di kir , lê hîn Alan di ber xwe de di peyivî .

- Ha..ha.. werin .. werin bajarê Qamişlo ..ha..ha , ji şifêr re bêje ha..ha.. bila xurtir bajo da ku em bi gihin Qamişlo .. bajarê ..ha..ha.

- (La hewle wela qiwete illa billah) , Alan !!Menal serê xwe hejand û bê hemdî wî ev peyv ji devê wî derket .

Alan deriyê ambulansê vekir , mumerîdê işaret da şufêr da ku raweste . zîqîn ji firêman anî di wê cada ku bi hêşirên ezmana şîl bûyî , Alan bi ser devê xwe de ket , xwîn ji dev û pozê wî hat , bê ku haya wî ji xwîna wî hebe , ew çû bi alî tirombêla ku bi dû ambulansê de di meşîya , ew jî sekinî .

Şufêrê Elmanî û pîreka xwe û zarokên xwe behitî man gava dîtin ku yekî biyanî bi xwîn giha wan û li dû wî xortekî biyanî û pîreka Elmanî û zilamê Elmanî bi berdilkên sipî li dû wî di bezin .

- Hêdî hêdî li dû turimbêla me da ..ha..ha..bimeşin da ku libêñ baranê ha..ha..ha.. xwiyanî bikin . Alan bi kurdî gote yê Elmanî .

- Wats .. wats? yê Elmanî li wî vegerand .

Ronî di çavîn Alan de nema , ewî bi ling û serî li turumbêla yê Elmanî dixist .

Baran bêtir xurt di barî , Menal û şufêr dest û piyên Alan girtin û ew xistin ambulensê de .

- Ha..ha.. Cako ..ha..ha.

Ji wê rojê û pêde nema Alan çav li Menal ûŞêrîn ket , li cem wî çile dibû buhar , buhar di bû havîn , havîn di bû payîz , payîz di bû çile ..

Her Alan li ber pencerê di rûniş , porê wî kurkirî , ruyê wî nepixî ji dermanan .

Her ku di bû dema xwarinê , ewî di gel kesên wek xwe xwarin di xwar , dermanê xwe vedixwar û yekser dihat ber pencera oda nexweşxana dînan di ber xwe de di got :

(Qaişlo bajarê evînê .. ha..ha..).

DAWI